
RAPORA TESPÎTÊ YA TEKÎLDARÊ REWŞA HEYÎ û PÊŞVEÇÛNAN, ÎXLALÊN MAFÎ YÊN GÎRTÎGEHA ÎMRALIYÊ SALA 2019yan

I. DESTPÊK

Sala 2019yan li Tirkîyê di qada hiqûq û sîyasetê de bandora pergala tecrîdê ya Îmralityê ji salên din zêdetir hatiye dîtin. Sîyaseta Tirkîyê ku wekî tê zanîn dijdemokrat û hertim dînamîka derbeyê pêk tîne, di pêvajoya 15-20ê Tîrmeha 2016an de bi mayînde Rewşa Neasayî (OHAL) û Bîryarnemeya Qanûnî (KHK) tê birêvebirin.

Nîşaneyê herî diyarkirîya vê pêvajoyê wekî pêşenûmûne pergala tecrîdê ya Îmralityê tê bikaranîn û li hemû welat bisazûmanî hatiye belavkirin. Heta sala 2016an li derveyî sînoren hiqûqî bikaranîna tecrîdê ya Îmralityê, wekî hiqûqiye tê nişandan û ji bo hemû welat zêdetir wekî halê normatif tê nişandan. Ev bi şiklê derveyê sînoren danekirina cezayî ya sîyasetê dixê holê û wekî nîqaşa ‘‘ Zagonên Ocalan’’ a ku bi dîroka 2005an ceza, darizandin û zagonên înfazê ji bo tevahiya welat bûye rewşeke hevpar.

Li derveyê nîşaneyên hiqûqî bi sîyasetê jî di sala 2019an de tecrîda Îmralityê tekiliyên dîyalektên cur bi cur zelaltir hatiye dîtin. Bi taybetî pevçûnên hatine jiyîn û ji bilî rewşên giran Birêz Ocalan di hevdiînan de bi ‘‘ Sekna Îmralityê’’ pêşniyarên tekîldarê rewşa heyî ji bo çareseriyê nêzîkbûn, rê û rêbazan parve kiriye. Ji bo vê nêzîkbûna Birêz Ocalan ji gelek derdorên cuda hatina bertekên erenî û nêyînî, Pergala Tecrîdê ya Îmralityê şer-aşîtî, mekanîka derbeyê, bi dîyalektîkên demokratîkbûn û tevlihevî- çareserî tekiliyê bi şiklê vekirî derxistiye holê. Di vê xalê de Birêz Ocalan bi taybetî di van çar salan de bi giştî bîst û yek sal e tecrîda ku li hemberî wî tê bikaranîn wekî tekîldarê şerên niha tê jiyîn daye xuyakirin û gotiye digel hemû zehmetiyên di nav vê deme de bi xêzîka aşîtiyê li berxwe dide.

Wekî tê zanîn di salên 2017 û 2018an de ji Birêz Ocalan bi tu awayî agahî nehatiye girtin. Dîroka dawî ya ku bi Birêz Ocalan re têkîlî hatiye danîn, 11 Îlonê sala 2016an ku li ser jiyana wî diltirsî zêdetir bûbû û protesto bilindbûbûn. Di 2019an de jî bi şiklê wekhev hevdiînanên parêzer-malbat û name, birûske, telefon û hwd...derfetên her cure tekiliyê bi temamî hat astengkirin û tecrîdeke teqez hat bikaranîn. Beramberî vê yeke bi hesasiyetên demokratîk û derketina bertekên micid sala 2019an bû sala derketina holê ya vê yeke.

Parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan û hevseroka Kongreya Civakê a Demokratîk Birêz Leyla Guven di 7ê Mijdarê de di darizandina dosyaya ku jê girtîbû de wisa axifî

‘‘Îro tecrîda ku li ser Birêz Ocalan tê kirin ne li ser kesekî ye, li ser mîletek tê bikaranîn. Tecrîd sûcê mîrovahiyê ye. Ez wekî perçeyekê vê mîletê ji protestokirina tecrîda li ser Birêz Ocalan dest bi greva birçîbûnê ya bê dem û bê dorveger dikim’’. Bi van gotinan destpêkirina greva birçîbûnê da xuyakirin. Vê berteka Birêz Leyla Guven di

demeke kin de di serî de li girtîgehên Tirkîyê di gelek deverên dinyayê de bi tevlibûna hezaran berdewam kir.

Di 12ê Çileyê 2019an de hevdîtina Birêz Ocalan bi birayê wî Mehmet Ocalan re pêk hatiye. Ev hevdîtina piştî 30 mehan ji ber ku ji Birêz Ocalan agahî hat girtin gelek girîng bû. Lê belê ji bo hevdîtina dawîya hefteyê roja şemiyê hatiye kirin û bi lez û bez û di mercên ne rehet de hatiye kirin ev rewş bê hiqûqiyê û tevgera bi kêfî zelaltir derxistiye holê.

II. HEVDÎTINÊN PARÊZERAN

Di mehên ewil a 2019an de serîlêdanên parêzeran ji bo hevdîtina Birêz Ocalan heta 15ê Adara 2019an bi biryara 1emîn Dadgeriya Înfaza Bûrsayê bi biryara binasiya bi dîroka 06.09.2018an, hevdîtinên parêzeran yê din jî bi binasiya biryara 13. 03. 2019an jî hêla 1emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê ve hat redkirin. Lê belê di encama bertekên ku ji hela rayagiştîya demokratîk ve hat dayîn de biryara 1emîn Dadgeha Cezayê Giran ku ji bo îtiraza parêzeran di dîroka 17. 04.2019 an de 6 meh sîndarkirin pêşdîtiye “ ji ber ku xusîsên zanînen tekîldarên binasiyê û delîlên nav dosyayê de derfeta venêrinê cih nagire” hatiye rakirin. Biryar di dîroka 22.04.2019 an de parêzeran re hatiye teblîxkirin. Ji vê dîrokê vir ve ji xeynî bersiva serîlêdanên parêzeran ji bo Birêz Ocalan û muwekilên din, xeynî hevdîtinên bi destûr nehatiye dayîn. Di vê mijarê de Wezaretê Dadê di dîroka 16.05.2019an de daye xuyakirin biryara rakirina qedexeyan hatiye dayîn û li ser hevdîtina parêzeran tu asteng tune ye.

Piştî hevdîtina dawî ku Birêz Ocalan ku bi parêzerên xwe re pêk aniye 27ê Tîrmeha 2011 ve ancax heşt sal şûnde 2ê Gulana 2019an de pêk hatiye. girtîgeha ku di giravekî girtî de ye û heşt sal ji hevdîtina parêzeran re girtiye tena sere xwe fahmkirina rehenda hiqûqî ya pergala tecrîdî re mînak e. Ji vê rewşê re piştî 21ê Tîrmeha 2016an zêdebûna qutkirina tekîliya name û hwd... rewşê zêdetir giran kiriye. Em diyar bikin di vê xalê de di şexsê Birêz Ocalan de pergala înfazê ku hatiye pêşxistin û bikaranîn ji hela AÎHM ve tespîta bi wesfê îşkenceyê ye û divê guherîn were kirin biryar hatiye girtin.

Bi Birêz Ocalan re di sala 2019an de di dîroka 02.05.2019, 22.05.2019, 12.06.2019, 18.06.2019 û 07.08.2019an de bi giştî pênc hevdîtina parêzeran pêk hatiye. Piştî demeke dirêj tekîliya Birêz Ocalan a ku dinyaya derve re hat temînkirin, ji nû ve hat fahmkirin li hemberî pirsgirekên bingehîn ên heremê xwe wekî bi navkirina “ sîyaseta jîyînê” hêza çareseriyê û bandora wê hatiye temînkirin. Birêz Ocalan di van hevdîtinan de di serî de çareseriyê meseleya Kurd û bi pêşveçûna dîrokî, tekîliyên Kurd û Tirkan, pêşveçûnên Sûrî û Bakurên Surîyê, grevên birçîbûnê, nasnameya Kurd, dîrok û çand, demokrasiya heremî, sîyaseta demokratîk, tîfaqa demokratîk û nêzikayîya mizakereyên demokratîk, qirçirina jinan û hwd... girêdayîya van mijaran gelek nixandinên girîng parve kiriye.

Di hevdîtina ewil a di dîroka 2yê Gulana 2019an de Birêz Ocalan bi şiklekî bandorker berberîbûna kurbûyî û li hemberî rewşa şer çareseriyê re û metoda demokratîk bi deklerasyona demokratîk a heft rêzikan bang li rayagiştî kiriye. Deklerasyonê sê girtiyên din ên ku li girtîgeha Îmraliyê de ne Veysî Aktaş, Omer Hayrî Konar û Hamîlî Yıldırım jî bi hev re bi şiklê “ banga rayagiştî” nivîsî bûn. Bi navbeynkariya parêzeran

re nîvîsa ku hat parvekirin li Tirkîyê û heremê beşa ku di lêgerîna demokratîkbûnê de ne kelecaneke micid derxist holê; bandor û hêza çareserîya Birêz Ocalan dîsa da xuyakirin.

Birêz Ocalan, vê daxuyaniyê wekî çareseriyê pîrsgirêkên dîrokî yê kok girtine were nîrxandin, tekîldarê rewşeke teng û rûbarî divê neye nîrxandin bi taybetî aniye ziman. Daxuyaniya rayagiştî ya her serenavê wê divê cuda were kitekirin û mecbûriyeta niqaşê hebe di vê şiklê de ye.

- 1- Pêvajoya dîrokî ya em ji nav derbas dibin pêdiviya li hevkirina civakî heye.
- 2- Di çareserîya pîrsgirêkan de ji dûrî çanda her cure berberbûn û şer, pêdivî bi şid metoda mizakereya demokratîk heye.
- 3-Pîrsgirêkên Tirkîyê û heta pîrsgirêkên heremê, di serî de şer, bi amûrên tundiya fîzîkî na, bi hêza nerm yanî bieqil, bi hêza politik û çandî em dikarin çareser bikin.
- 4 -Em bawer dikin ku di çarçevoya Hêzên Demokratîk yê Sûrîyê (SDG) de pîrsgirêkên Surîyê bi sekna ji çanda şer dûr; cihên ku di nav de ne, rewş tevahiya Surîyê de di çarçoveya temînata makezagonî armanca bi perspektîfa demokrasiya heremî were çareser kirin. Di vê bende de hesasiyetên Tirkîyê re divê bihest bin.
- 5-Hevalên li girtîgehê ne û derve ne ji berxwedana wan re rêz digirin lê divê tendurîstiya xwe nexin talukeyê û negihîjin encama mirinê vê xalê bi girîngî dixwazim bidim xuyakirin. Ji bo me tendurîstiya wan a eqilî, fîzîkî û ruhî li ser hertiştî de ye. Ji bilî vana em bawer dikin nêzîkatiya herî watedar tekîldarê pêşveçûna sekna zîhnî û ruhî ye.
- 6- Sekna me ya Îmraliyê daxuyaniya me ya di Newroza 2013an de tarza ku me daye xuyakirin biryara bi kûrahî û zelaltirîn domandinê ye.
- 7- Ji bo me aşîtiyeke bi rûmet û çareserîya sîyaseta demokratîk bîngeh e.

Bi vê yekê re beşa pêncan a nîvîsa bi heft rêzîkî de hatiye vegotin beşa girêdayî grevên birçîbûnê de grevên birçîbûnê û rojîya mirinê ji hêla çalakîsazan ve bi rêzdarî hatiye pêşvazîkirin, lê belê ji ber ku bê hiqûqîya salên dirêj e didome û ji bo tecrîd teqez bê rakirin bi van daxwazan çalakî hatiye domandin. Dema ku rewşa tendurîstiya çalakîsazan hatiye rewşa xetere û mirînên bi armanca protesteyo ji hêla çalakîsazan ve zêdetir bû di dîroka 22ê Gulana 2019an de di girtîgeha Îmraliyê de hevdîtînek din pêk hatiye. Di hevdîtina 22ê Gulana 2019an de Birêz Ocalan ji xeynî nîvîsa ku bi heft rêzikan dabû zêdetir rasterast ji bo grevên birçîbûnê û rojîya mirinê ji bo çalakîsaz çalakiya xwe bi dawî bikin nameyeke nivîsîbû. Grevên birçîbûnê û rojîya mirinê ya ku gihaştîbû rojên 200î li ser vê bangawaziya Birêz Ocalan di dîroka 26ê Gulana 2019an de bi dawî bû.

Birêz Ocalan di hevdîtina parêzeran de li ser grevên birçîbûnê nîrxandinên giran kiriye. Di hevdîtina ku 12ê Hezîrana 2019an de feraseta sîyaseta xwe wisa vegotiye “ em li hemberî mirinê jiyane diparêzin. Yê me sîyaseta jiyandinê ye” piştî van

gotinan rewşa xwe wisa aniye ziman ‘‘ Ez lêgerînerê rastî, azadî û edaletê me. Lê belê ez sîyaseta mîrinê jî nadomînim. Edeleta rast, demokrasiya rast, azadiya rast. Ez 21 sal in li vir im. Ez jiyandina xwe jî ya gelê xwe jî pêk tînim.

Di her sê hevdîtînen ku pêk hatine de Birêz Ocalan pêşveçûnên dîrokî yên tekiliyên Tirk û Kurdan û pîrsgirêkên heyî yên li bakûrê Sûriyê berdewam dikin li ser rewşa îroyîn nîrxandinên bi hurgulî parve kiriye. Gotiye ez hewl didim têkevim pêşiya tekiliya Kurd û Tirkan a ku derba giran a dîrokî bigire. Tekildarê bi hev re bûna dirokiya Tirk û Kurdan gotiye’’ Di Mezopotamyayê de gava Kurd werin qedandin di Anatolyayê de li ser navê Tirkîtiyê tiştêk namîne. Hebûn û pêşveçûnan Kurdan tê wateya hêzdarbûna Tirkan. Ev nîşaneyê dîrokî ye; dahênana me nîn e. Divê her kes vê yeke fahm bike. Yan na ew ê mezin were wendakirin. Bere jî min gotibû Tirk Kurd bê Kurd Tirk nabe. Ev wisa ye. Min gelek caran vegot , ez vegotina xwe didomînim. Dîrok bi hemû rastiya xwe eşkere li holê ye’’.

Bi tekildarê Bakûrê Sûriyê di hevdîtina ewil a dîroka 2ê Gulanê de nêrînen ku parve kiriye hema hema di hemû hevdîtînen xwe de parve kiriye. Daye xuyakirin polîtîkayên derve û hûndir yên Tirkîyê û Sûriyê hatine halê bi hev ve gîrêdanê, ketine nav hevdu. Ji bo îroyîn vebijarka Birêz Ocalan a ku nêzikatiya demokrasiya heremî ya gihiştîye temînata makeqanûnî tene ji bo Sûriyê na ji bo erdnigariyên di nav tevlihevîyê de ne vebijêrka çareseriyê ye. Di vê mijarê de Birêz Ocalan bi taybetî gotiye ger derfet hebe di nav tevahiya Sûriyê de pîrsgirêka Kurdan jî di nav de ji bo hemû pîrsgirêkên Sûriyê rolekê erenî dikare bigire.

Hevdîtina 18ê Hezîrana 2019an wekî hevdîtînen din hevdîtîneke gelek dengvedaye û hatiye nîqaşkirin. Birêz Ocalan wekî ferasetekî siyaset û metodê ji damezrandina komarê û ji vir ve li hemberî sîyaseta berberî feraseta tifaqa demokratîk û divêtiya temsîliyeta xêzika sêyemîn re balkişandîye. Diyarkiriye divê banga demokratîkbûnê ji hemû baregehên sîyasî re were kirin mizakereya demokratîk û bi pêdîviya sîyaseta çareseriyê xêza sêyemîn xwe diyarker bide xuyakirin.

Bi giştî di xala çareseriyê pîrsgirêkan de ‘ lihevkirina demokratîk, sîyaseta azad û hiqûqa gerdûnî’ li ser van sê xalan daye xuyakirin divê sîyaseta demokratîk pêşve biçê, di nav hiqûqa gerdûnî de têgeha Tifaqa Makeqanûnî ya Demokratîk pêşniyar kiriye.

Dîroka 7ê Tebaxa 2019an di Îmraliyê de hevdîtîna parêzeran a pêncemîn û dawî bûye. Di vê hevdîtîne de Birêz Ocalan tekildarê rewşa şer û pevçûnên heyî hişyarîyên baldar kiriye û bi nîrxandinan re ji bo çareseriyê bangawazî kiriye. Di bin navê şerê Tirk û Kurdan de davîkek hatiye danîn; bi salan e çareserî bi şer û pevçûnan pêk nayê bi vê gotinan derb bi hişê dewletê ya rasyonel daye lê belê dewlet diyarkiriye ji vê hişmendiyê dûr e.

Di vê dema ku mijara Kurdan ya ku ji hêla navnetewî de zêdetir wesf qezenc kiriye ji bo çareseriyê gavên ku neyên avêtin ew ê pirsgirekê zêdetir kûrtir bikin bi van nirxandinan Birêz Ocalan, bi bîrxistinên din re ji bo çareseriyê mijarên vîn, biryarî û hêzê carekî din guncaw dîtiye bixe holê. Bi vî şiklî bangawazî kiriye ‘ bi hêzekê derasayî ez hewl didim hişê dewletê analiz bikim. Hewl didim ji Kurdan re cih vekim. Di nava hefteyekê de rewşa pevçûnê û îhtîmala wê dikarim ji holê rakim. Bila pêşiya min vebe ez dikarim di nava hefteyekê de hêza çareseriyê baifirînim. Min gotibû ez ji bo çareseriyê amade me. Dewlet jî hişê dewletê jî divê tiştên pêwist bike.’’

Di hevdîtinên parêzeran ên ku pêk hatiye de Birêz Ocalan bi tekîldarê dîroka Kurdan, kesayet û çandê ve gelek nirxandin kiriye, daye xuyakirin 40 sal in berawajîya nêzikatiyên komî yên wekî çîna teng, êl û eşîran hewl dide hişê Kurdan yên civakekî azad, jiyana azad û mirovên azad were sazîkirin.

III.SERÎLÊDANÊN GIŞTÎ YÊN JI BO HEVDÎTÎNA GÎRTÎGEHÊ

Serîlêdanên parêzeran yên ku ji bo girtîgeha Îmraliyê hatiye kirin wekî me li jorê jî rave kiribû di sala 2019an de heta 15ê Adara 2019an ji hêla 1emîn Dadgeriya Înfaz a Bûrsayê ve dîroka 06.09.2018 û bi biryara hejmara 2018/4526 û 2019/1299 ve ev biryar wekî hincet hatiye nişandan û daxwaza hevdîtinê hatiye redkirin. Dîsa her du biryar jî pêşdîtinên bi sînordarkirina 6 mehî ve di dîroka 02.03.2018 de bi biryara Dadgeriya Înfaz a Bûrsayê ve biryarên bi temamî wek hev û otomatîk hatiye nûjenkirin.

Di encama îtîrazên parêzeran ji bo biryara di dîroka 13.03.2019an de ji hêla 1emîn Dadgeha Cezayê Giran a Bûrsayê ve di 17.04.2019 an de wisa hatiye gotin ‘ xûsûsên ku tekîldarê belge û zanînen ku bûne hincet ji bo di nav dosyayê de derfeta ku were kontrolkirin tune ye ‘ bi van hincetan hatiye rakirin. Piştî dîroka 17.04.2019 tekîldarê hevdîtinê parêzeran astengekeke fermî tune ye ji hêla Wezaretê Dadê ve eşkere di dîroka 16.05.2019an de bi rayagiştî re hatiye parvekirin. Lê belê li gorî van hemû daneyan di sala 2019an de Birêz Ocalan bi parêzerên xwe re tene pênc caran hevdîtin kiriye. Birêz Konar, Birêz Yıldırım û Birêz Aktaş jî ji Adara 2015an ku neqlê Girtîgeha Îmraliyê hatine kirin vir ve tu hevdîtinê bi parêzeran re nekirine û di 2019an de jî dîsa destûr nehatiye dayîn.

Di vê çarçoveya ku me diyar kirî de di sala 2019an de ji bo hevdîtinên parêzeran ku bi Birêz Ocalan re were kirin heta dîroka 19.04.2019an 32 serîlêdanên hatine kirin biryara dadgehê wekî hincet hatiye nişandan û hatiye redkirin. Li ber vê yeke serîlêdanên piştî di dîroka 26.04.2019an de 02.05.2019, 22.05.2019, 12.06.2019, 18.06.2019, 07.08.2019 di van dîrokan de xeynî pênc hevdîtinên parêzeran tekîldarê serîlêdanên ji bo hevdîtinê parêzeran tu bersiv nehatiye dayîn.

Li Girtîgeha Îmralityê di serîlêdanên ji bo hevdîtînen malbat û wasîyan de di sala 2018an de bi hinceta cezayên dîsîplîn ên kêfî û bê hiqûqî yên ku hatine sazîkirin bikaranîna astengîkirinê di sala 2019an de jî bi awayekî sîstematîk berdewam kiriye.

Di sala 2018an de ji hêla Serokatiya Lîjneya Dîsîplînê Gerîndeheyîha Saziya Înfaza Cezayê ya Ewlehiya Bilind a Tîpa F'ya Îmralityê dîroka 14.09.2018 û bi hejmara 201871-2-3-4- biryara qedexeya hevdîtîne ya girtî bi xizmên xwe re bikin, bi awayekî rûtîn dîroka 02.01.2019 û hejmara 2019/1-2-3-4, dîroka 22.04.2019 û hejmara 2019/5, dîroka 10.07.2019 û hejmara 2019/6, dîroka 21.10.2019 û hejmara 2019/7 hatiye nûjenkirin.

Biryarên bûne mijar di serîlêdanên hevdîtîna malbatan de bi bersîva nepejirandinê re wekî hincet piştî ku dema îtirazê derbas bûye ji parêzeran re hatiye gotin. Biryarên cezayên dîsîplînê ku bi awayekî kêfî û bê hiqûqî ye û palpiştî xwe nikare bide bûyerek li hemberî hemû serîlêdanên bi îsrar jî naverok bi parêzeran re nehatiye parvekirin. Biryarên ku di derheqê Birêz Ocalan de hatine girtin di pêvajoya ku destûr nehatiye dayîn bi parêzerên xwe re bikeve têkîliyê û alikariya hiqûqî bigire di vê pêvajoyê de ji ber ku îtiraz nekiriye di demekê kin de teqez bûye û bi merheleyên hiqûqî encam bûye. Di tekîldira girtiyên din de jî ji bo îtirazên ewil wan kirine û pirsgrêka demê hatiye derbaskirin û pêvajoyê parêzeran dewr girtine û pêvajoya hiqûqî didomînin.

Biryara cezayên dîsîplînê ku bi awayekî bê hiqûqî 3 mehan dane li ser hevdîtîna malbatan ji bo dema dest pê kirin û qedandinê jî riayet nehatiye kirin. Di çarçoveya hevdîtîna malbatan de di daxwaza hevdîtîna wasîyan de jî li gorî Makeqanûna Înfazê ya Cezayê hejmara 5275 an bi awayekî vekirî hatiye diyarkirin cezayên dîsîplînê li hevdîtîna wasîyan nayê bikaranîn li gorî vê biryarê jî bi awayekî kêfî û dij hiqûqî hatiye astegkirin.

Di sala 2019an de di dîroka 12.01.2019 (Şemî û tene xizmê Birêz Ocalan Birêz Mehmet Ocalan), 05.06.2019 û 12.08.2019 de serîlêdanên hevdîtîne hatine qebûlîkirin derfeta malbat hevdîtîna bikin hatiye dayîn; 42 serîlêdanan bi awayekî eşkere hatiye redîkirin ji 4 serîlêdanan re jî bersiv nehatiye dayîn. Di dîroka 05.06.2019 û 12.08.2019 de ji ber sedema Cejnê di hevdîtîna malbatan de Birêz Konar, Birêz Yildirim û Birêz Aktaş ên ku li Girava Îmralityê de ne di Adara 2015 vir ve cara yekemîn bi malbatên xwe re hevdîtîna kirin.

Di encamê de di sala 2019an de ji 5 hevdîtîna bi parêzeran û ji 3 hevdîtîna malbatan re destûr hatiye dayîn ji hêla din ve serîlêdanên 98 hevdîtîna parêzeran û 46 hevdîtîna malbat û wasîyan nehatiye qebûlîkirin.

IV. NIKARIBÛNA BIKARANÎNA MAFÊ XWE YÊ RAGIHANDIN Û AGAHÎGIRTINÊ

Wekî me li jorê rave kir piştî hevdîtina di 11ê Îlonê 2016an a malbatê de heta 12ê Çileyê 2019an ne ji Îmraliyê dinyaya derve re ne jî ji dinyaya derve ji Îmraliyê re derfeta agahîgirtin û ragihandinê nehatiye dayîn. Hevdîtina malbatê ya 12ê Çileyê 2019an di mercên derasayîde dawîya hefteyê di demekê kin de pêk hatiye. Bi vê yekê re her çiqas palpišta hiqûqî ya tecrîda mutleq be jî biryara dawî ya dadgehê di dîroka 17.04.2019an de ji hêla Dadgeha Cezayê Giran a Bursayê hatibe rakirin jî ji hêla bikaranîna ragihandin û agahîgirtinê de pêşveçûneke girîng nehatiye dîtîn. Dîroka 2ê Gulana 2019an û di hevdîtînên din ên parêzeran de nameyên ku di dîrokên cuda de ji Birêz Ocalan re hatine şandin hatiye hîn kirin ku heta niha 2-3 heb hatine dayîn.

Di dîroka 06.02.2019an de Dadgeha Makeqanûnê di 2015an de qedexekirina mafê telefonê yê Birêz Aktaş û Birêz Konarê li ser vê yekê biryara îxlala azadiyê ya ragihandiniyê daye. Dîsa li ser navê Birêz Nasrullah Kuran ê gava li Girtîgeha Îmraliyê bû serîlêdanên ji bo wî hatibû kirin di dîroka 06.02.2019an de biryara îxlala ragihandiniyê hatibû dayîn. Tevî biryara Dadgeha Makeqanûnê bikaranîna qedexeya telefonê didome. Serîlêdanên di derheqê Birêz Ocalan de hîn encam nebûye. Ji bo biryara Dadgeha Makeqanûnê ji bo girtî mafê telefonê bikarbînîna çiqas serî li Dadgeriya Înfaz a Bursayê hatibe dayîn jî dijberê biryara Dadgeriya Makeqanûnê daxwaz hatiye redkirin.

V. HELWESTA KOMÎTEYA PÊŞÎGIRTINA ÎŞKENCEYÊ (CPT)

Wekî tê zanîn ji bo kontrolkirin û şopandina qewîmînên li ser Girtîgeha Îmraliyê bi awayê navnetewî sazîyên herî rayedar yek jî Komîteya Pêşîgirtina Îşkenceyê (CPT) ye. Di vê wateyê de mijara kûrbûn û derbaskirina Pêvajoya Tecrîdê ya Îmraliyê de rolekê wê ya girîng heye. CPT di têkildarê rapora xwe ya 28-29ê Nîsana 2016an bi hinceta prosedûrên cur bi cur encax du sal şûnde di dîroka 20ê Adara 2018an de dabû xuyakirin. Ev daxuyanî bi taybetî ji hêla demê ve ji naveroka serbixwe siberekirina tecrîda mutleq û sedema sawîna têgihan bandorekê pêk hatibû. Di navbera dema hevdîtin pêk hatiye û rapor hatiye ravekirin de bingeha sîyasî û hiqûqî tiştên li Tirkîyê tê jiyîn bi pîvanek girîng guherîbû û ji hêla antîdemokrasîyê de zêdetir hatibû sazkirin. Di vê xalê de li gorî guncawbûna peymannameya sazkirina pêşîlêgirtina îşkenceyê bendewariya ji hêla CPT yê ve ; Îmraliya ku bi tu awayî ragihandin tune ye ji dinyaya derve re bi tamamî têkîlî hatîye qûtkirin hevdîtinekê ‘ de facto ’ (di pratîkê de) tespîta bê hiqûqiyê bû.

Di sala 2019an ku radeya bertekan û diltirsîya ji bo Birêz Ocalan zêde bûbû CPT ji van bertekan re nikaribû bêdeng bimîne û di dîroka 6-17 2019an de hevdîtînen li girtîgehên Tirkîyê di plansaziya wan de tune bû jî Girtîgeha Îmraliyê li bernameya xwe zêde kir. Di dîroka 7ê Gulana 2019an de hevdîtîneke li Girtîgeha Îmraliyê pêk anî. Tekîldarê naveroka hevdîtîne hurgîlî bi rayagiştî re nehatiye parvekirin. Di vê xalê de CPT di mercên Tirkîyê yên ku ewlehiya hiqûqî tune û pêşdîtin pêk nayê divê demildest raporên parve bike û dest bi şopandinê bike. Bi vê yekê re derveyê hevdîtînan pêkhatinên Girtîgeha Îmraliyê bi awayê raporên sê mehan ên serdemî nivîskirîne û di heman deme de hevdîtînen rû bi rû yên di periyotên cuda de pêk hatine jî tînen parvekirin.

V. DOZÊN DIDOMIN Û PEYANÊN HIQÛQÎ

A. SERÎLÊDANÊN DI HIQÛQA HÛNDIRÎN Û DADGEHA MAKEQANÛNÊ DE DERDEST BÛNE:

- 1- Li gorî Makeqanûna Înfazê bi hejmara 5275 û rêzîka 25emîn ji bo pirsgerêkên tendûristiyê yên di mercên înfazê de nayên çareserkirin nexweşxaneyekê baş ê dewletê yan jî di heman mercan de nexweşxaneyekî zanîngehê de werin dermankirin ji bo Birêz Ocalan û girtiyên li ber her çiqas ev rewş gengaz û pêwîst be jî ji vê mafên xwe bêpar tînen hiştin. Ji bo gihîştina mafê tendûristiyê û ji bo dawî anîna qedexeya parêzeran ku de vê serdemê de tê bikaranîn di 12ê Tîrmeha 2013an de sêrî li Dadgeriya Înfazê ya Bursayê hatiye dayîn. Serîlêdana ku hatiye redkirin di Dadgeha Makeqanûnê de bi hejmara 2015/12433 berdewam dike.
- 2- Li ser piştî 27ê Tîrmeha 2011an ku hevdîtina parêzeran a dawî hatiye kirin destûr ji bo hevdîtina parêzeran nehatiye dayîn di dîroka 05.11.2012an de ji bo mercên girtîgehê li gorî hiqûqê werin rewşa guncaw û ji bo hevdîtina parêzeran pêk were serî li Dadgeriya Înfazê ya Bursayê hatiye dayîn. Dadgeriya Înfazê ya Bursayê piştî demekê dirêj bersiva neyînî daye. Ev serîlêdan wekî serîlêdana li jor bi hejmara esasî ya 2015/11221 çûye Dadgeha Makeqanûnê lê belê Dadgeha Makeqanûnê tekîldarê vê serîlêdanê biryarekê nedaye.
- 3- a- Eşkerekirina OHALê dîroka 20ê Tîrmeha 2016an, pêkanîna xwe ya ewil biryara bi dîroka 21.07.2016 ve ji hêla 1emîn Dadgeriya Înfazê ya Bursayê ve di Girtîgeha Îmraliyê de nîşan daye. Li ser redkirina îtirazên ji bo rakirina biryarê dosya di Dadgeha Meqanûnê de bi dîroka 27ê Cotmeha 2016an û bi hejmara esas a 2016/80376 berdewam dike.

3-b-Di dîroka 21.08.2017an de tekîldarê biryara ku me li jor diyar kiribû di derheqê dadger û dozgerên ku dijberê hiqûqê serîlêdanan red kirine ji Lîjneya Dozger û Dadgeran re bangawaziya sûc hatiye kirin. Di derheqê miamelaye ku neketiye meriyetê dîroka 11.10.2019an de ji bo gilî ji nû ve were vekolînkirin serî ji lemîn Daîreya Lîjneya Dadgeh û Dozgeran re hatiye dayîn.

4-Biryara ku ji hêla Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê ve di dîroka 02.03.2018an de hatiye dayîn kêmkirina 6 meh hevdîtîn, agahîgirtin û ragihandinê di pêvajoya îtirazê de hatiye redkirin piştî teqezbûna vê redbûnê serî lê dana dîroka 06.06.2018 û bi hejmara bîngêhîn a 2018/15703 di Dadgeha Makeqanûnê de didome.

5-Biryara ku ji hêla Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê di dîroka 06.09.2018an de hatiye dayîn kêmkirina 6 meh hevdîtîn, agahîgirtin û ragihandinê di pêvajoya hatiye redkirin piştî teqezbûna vê redbûnê serî lê dana dîroka 06.09.2018 û bi hejmara bîngêhîn a 2018/30824 di Dadgeha Makeqanûnê de didome.

6-Lîjneya Dîsîplînê ya Girtîgeha Îmrîyê ku bûye sedema kêmkirina 3 mehan hevdîtîna malbatan a Birêz Ocalan û mûwekîlên din tekîldarê biryarên di dîroka 14.09.2018an de miamelîyên hiqûqî yên ku di Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê de dihat meşandin ligel şanîdana wekaletê dijhiqûqî parêzer nehatine daxil kirin. Di derheqê Dadgerên berpirsiyar de di dîroka 17.12.2018an de ji Serdozgeriya Komara Bûrsayê û Lîjneya Dadger û Dozgeran re bangawaziya sûc û giliyê hatiye kirin.

7-Lîjneya Dîsîplînê ya Girtîgeha Îmrîyê ku bûye sedema kêmkirina 3 mehan hevdîtîna malbatan a Birêz Ocalan û mûwekîlên din tekîldarên biryarên di dîroka 14.09.2018an de serî lê dana Dadgeha Makeqanûnê didome. (Birêz Ocalan 2019/736, Birêz Aktaş 2019/1399, Birêz Konar 2019/1938, Birêz Yildirim 2019/1484)

8-Di dîroka 14.12.2018an de redkirina îtirazên li hemberî kêmkirina hevdîtîna malbatan a ku dem derbas bûye û nûnertiya zagonî bergeh nake di dîroka 08.02.2019an de serî li Dadgeha Makeqanûnê re hatiye dayîn. Serî lê dana tekîldarê hejmara bîngêhîn a girêdayê Birêz Ocalan hîn nehatiye gotin ji hêla Birêz Konar 2019/4960, ji hêla Birêz Aktaş 2019/5652, ji hêla Birêz Yildirim ve bi hejmara bîngêhîn 2019/4960 re berdeyam dike.

9-Bi sedema Birêz Ocalan ji mafê telefon û hevdîtîna bêpar maye serî lê dana ji Dadgeha Makeqanû re bi dîroka 19.09.2016 û hejmara bîngêhîn 2016/21369 didome.

10-Tekîldarê pirtûka Birêz Ocalan ku ji pêşkeşiya AÎHMê pêk tê ji bo rakirina biryara qedexeyê û civandinê a ku ji hêla 1 emîn Dadgeha Lîhevkerin û Cezayê ya Wanê ve hatibû dayîn di 15ê Sibata 2016an de serî lê dana ku ji Dadgeha Makeqanûnê re hatiye kirin didome. Dadgeha Makeqanûnê ji bo biryara qedexeya heman naverokê di dîroka 25.06.2014an de biryara azadiya vegotinê îxlal dike daye ligel vê yekê Dadgeha Heremî AYMê tune hesabandîye.

11- Hevdîtînen ku di navbera dîroka 01.06.2005 û 16.12.2009an de hatine kirin bi sedema bi amûra deng qeydkirinê qeyd hatiye kirin, dest danîne li ser belgên hevdîtîna û

di hevdîtîne de xebatkarek li wir sekiniye li hemberî serî lê dana HSYKê neketiye meriyetê doza betalkirina miameleyê di Şûrayê Dewletê de bi hejmarê 2016/16150 E. didome.

12- Lîjneya Dîsîplînê ya Gîrîgeha Îmralityê ku bûye sedema kêmkirina 3 mehan hevdîtina malbatan li Îmralityê li hemberî biryara 02.01.2019 ji hêla Birêz Aktaş, Birêz Konar û Birêz Yildirim ve serî lê dana ku ji Dadgeha Makeqanûnê re hatiye kirin didome. (2019/7194, 2019/6991, 2019/6948)

13- Lîjneya Dîsîplînê ya Gîrtîgeha Îmralityê ku bûye sedema kêmkirina 3 mehan hevdîtina malbatan li Îmralityê li hemberî biryara 10.07.2019 ji hêla Birêz Aktaş, Birêz Konar û Birêz Yildirim ve serî lê dana Dadgeha Makeqanûnê didome. (2019/31773)

14- Lîjneya Dîsîplînê ya Girtîgeha Îmralityê ku bûye sedema kêmkirina 3 mehan hevdîtina malbatan a li Îmralityê li hemberî biryara 21.10.2019 ji hêla Birêz Aktaş, Birêz Konar û Birêz Yildirim ve di dîroka 25.12.2019an de serî lê dana Dadgeha Makeqanûnê didome.

15- Tekîldarê îxlala mafê nameya Birêz Aktaş Dadgeha Makeqanûnê serî lê dana bi hejmarê 2015/14246 E. û serî lê dana heman naverokê ya Birêz Yildirim Dadgeha Makeqanûnê bi hejmarê 2016/6180 E. didome.

B. Serîlêdanên di Dadgeha Mafê Mirovahî ya Ewropayê de Derdest Bûne:

Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê di du mijarên bingehîn ên tekîldarê darizandin û înfaza Birêz Ocalan de ye biryara îxlalê daye. Ev biryar tekîldarê Darizandina ji Nû ve û Cezayê Girantirîn ê Heta hetayê ye. Lê belê di hiqûqa navîn de divêtiyên aliyê hiqûqî bi cîh nehatiye. Li ber van her du biryarên AÎHMê di hinek serîlêdanan de serîlêdanên ku hatine biderengxistin tarza tenê bersiva Hikumetê esas girtiye girantirkirina tecrîda ku li Îmralityê pêk tê misyoneke girîng digire.

Pîvanên mafê mirovahî ya gerdûnî ji hêla bikaranîna hiqûqa erênî û di mijara kontrolkirinê de ji saziya herî rayedar AÎHMê bendewariya li gorî rola damezrandina xwe û li gorî peymanê mafê mirovan tevbigere. Di çarçevoyê de dosyayên ku li AÎHMê didomin;

1- Ji di dîroka 27ê Tîrmeha 2011 heta 2ê Gulana 2019 bi awayekî bênavber domandina qedexeya parêzeran re helwesta bêeleqê ya AÎHMê bandor kiriye. Piştî qedexeya hevdîtîne ku 3 mehan ditîye di Cotmeha 2011an de li ser serîlêdanên heremî bê encam man ji AÎHMê re bi hejmarê **74751/11** serîlêdan hatiye kirin. Lê belê dosya di sala 2019an de bi encam nebûye.

2- AİHM piştî Birêz Ocalan bi komployek ji Tirkîyê re teslîm hat kirin. Hikm da darizandinên 1999an mafê darizandina bidalet îxlal kiriye. Qanûna Darazî ya Cezayê ku mafê ji nû ve darizandinê birêkûpêk dike bi rêgeza 311 emîn bi taybetî ji bo bikeve pêşiya feydegirtina vê mafê Birêz Ocalan hatiye birêkûpêkkirin. Ji bo bikeve pêşiya feydegirtina Birêz Ocalan di sala 2003an de di rastkirina qanûnê de 221 kesên ku neyînî bandor li ser wan çêbû ji bo îadeya mafê dosyaya wan di dîroka 11.04.2013an de ji nû ve qanûn hatiye rastkirin. Lê belê di vê rastkirinê de bi sedema feydegirtina Birêz Ocalan asteng bikin rewşeke awarte hatiye danîn. Betalkirina qanûna taybet a ku îxlala rêzika wekhevîya makeqanûnê dike û ji bo mafê darizandinê ji nû ve Birêz Ocalan re were dayîn serîlêdanên Dadgehên Makeqanûnê û heremî bêencam man serîlêdan bi qeyda **34836/16** ve serîlêdana AİHMê berdewam dike.

3-AİHM di biryara xwe ya 18ê Adara 2014an de (**hejmara serîlêdana dosyaya pevghiştandî 24069/03, 197/04, 6201/06 û 10464/07**) peymana cezaya ku ji Birêz Ocalan re hatiye dayîn û ji bo heta hetayê li girtîgehê bimîne girantirîn cezaya heta hetayê di rêgeza 3 emîn bi bergeha ceza dervê mirovahiyê ye û qedexeya miameleya xirab diyar kiriye û Tirkîyê mehkûm kiriye. Ji 2019an vir ve di girtîgehên Tirkîyê de hejmara kesên cezaya girantirîn heta hetayê girtine nehatiye zelalkirin lê tê fikirîn nêzî hezar kesan in. Piştî vê biryara AİHMê divê Tirkîye vê cezayê dîsa bigirta dest û bi sererastkirinên zagonî li gorî biryarên AİHMê baştirîn bikira lê heta niha tu gavekî erenî neavêtiye. Divêtiya vê biryarê bi rastkirinên hiqûqî cezayê heta hetayê ji holê rakirine. Tekîldarê vê mijarê hewldanên parêzeran bi şopandina biryarên AİHMê Komîteya Wezîran a Ak ê ya berpirsiyare didome. AK, BK, biryara ku AİHMê tekîldarê Birêz Ocalan daye girtine şopandinê. Ji bo divêtiyên biryarên AİHMê pêk were ji Komîteya Wezîran re di dîroka 06.06.2016, 05.06.2017 û 25.06.2018an de serîlêdanên nivîskî hatiye kirin û di dîrokên cur bi cur de hevdîtînan rû bi rû pêk hatine. Di serîlêdanên ku hatine kirin de daxwaza hewldan pêk werin û di biryara îxlalê de Tirkîye biryara AİHMê bi cih neaniye divê were tespîtîkirin hatiye kirin.

4-Di salên 2003, 2004, 2006 û 2007an de çar serîlêdanên cuda yên Birêz Ocalan ku ji Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê re hatiye kirin, hatiye yek kirin di 14ê Adara 2014an de bi dosyayek biryar li ser hatiye dayîn. AİHM, hinek rêgezên ku daxwaza ji îxlalê re hikm bike qebûl kiriye lê hinek rêgezan nenirxandiye. Îtîraza ku ew ê ji Daîreya Mezînan re were kirin ji bo 3 meh dema xistina mafê heye, di bergeha mafê parastinê de tekîldarê biryarê ji bo bi Birêz Ocalan re hevdîtînan pêk were ji Dadgeha Makeqanûnê re serîlêdana bi daxwaza pêşgiriya hatiye kirin. Lê belê li ser Dadgeha Makeqanûnê dosyaya bi hejmara 2014/5264 red kiriye di dîroka 28.09.2018an de çûye AİHMê.

5-Ji dewleta Yunanîstanê re ji bo bûye sedema Birêz Ocalan bi komployeke navnetewî were girtin û ji Tirkîyê re were radestkirin bi sedema îxmal û çalakîyên dijhiqûqî di dîroka 04/12/2008an de li Atînayê Dadgeha Rêvebirinê re doz hatiye vekirin. Li ser Dadgeha Rêvebirina Atînayê û Dadgeha Temyîza Rêvebirinê dozê redkirine bi serîlêdana dîroka 01.02.2019an û bi hejmara 19/9259 E dosya çûye AİHMê.

6-Birêz Aktaş tekîldarê pirtûka Birêz Ocalan a Çareseriya Şaristaniya Demokratîk nehatiye dayîn di serîlêdanan de ji bo riyên hiqûqa navîn qediyaye di dîroka 06.12.2019an de dosya çûye AÎHMê.

VI. ENCAM

- Sala 2019an di Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê de bûye sala sîtava sîyasî û hiqûqî zelaltir were fahmkirin. Lewre bi tecrîde re sîyaseta berberîbûn û pevçûna kûrtir, derfetên Birêz Ocalan bikaribe gotinên xwe bibêje derxist holê bi riya çareseriya demokratîk û metoden ve rû bi rû tê. Di van çar salên dawiyê de tecrîd kûrtirîn tê ferzkirin tiştên ku tên jiyîn her kes raçav û tecrûbe kiriye. Jiyîna vê rewşê bi awayekî kûrtirîn didome. Li hemberî vê yekê nêzêkatiyên di xala çareseriya pirsgerêkan de bandor û hêza çareseriya Birêz Ocalan zelaltir tê fahmkirin. Ji vê hêlê ve sala 2019an gava bi pêşketinên ku hatine jiyîn ve were nirxandin Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê bi şer û aşîfî, mekanîka derbeyê û demokratîkbûn, tevlihevî û diyalektîkên çareseriyê re rasterast tekîldar e “ Sekna Îmraliyê” û “ sîyaseta jiyînê”ya Birêz Ocalan jî rewşa pîleya aşîtiya bi rûmet û di zemîna sîyaseta demokratîk de xuyabûn derdixê holê.
- Di mijara astengiya bikaranîna mafên hiqûqî yê bingehîn ya Birêz Ocalan de mekanîzmayên hiqûqa navîn ji tu rêgezeke zagonî re yan jî biryara dadgehê re pêwistî nabîne û didome ev yek derdixê holê ev rewş kêfî û bê hiqûqî ye. Lîgel daxuyaniyên Wezîrê Dadê ku berzîrîn kesên mekanîzmaya zagonî ye û ev rewş tê domandin mijarê zêdetîr bandorker dike.
- Pêvajoya ku ewqas xitimandin di mekanîzmayên hiqûqa navîn de tê jiyîn CPT û AÎHM dijberê nirxên saziyên xwe bi helwestên pasîf kûrtirkirina tecrîdê re di rêjeyê girîng de alîkarî dîkin. Lê belê ev sazî li gorî rist û misyona xwe tevbigerin bi pîvangeke girîng dikarîn tecrîdê lawaz bikin.
- Van rewşên ku me diyar kiriye Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê dijberê mekanîzmaya sînordar a hevdiînên malbat û parêzeran, divê baş were fahmkirin mekanîzmaya rêvebirina sîyasî û hiqûqî ya ku tevahîya birêkûpêkkirina înfazê û darizandina cezayê dihûndirîne. Kûrtirkirina vê pergale di her wateya sîyasî û hiqûqî de kûrtirkirina kêfiyeta bê pîvan e lewra derbaskirin jî hêzdarbûna derfetên çareseriya demokratîk e. Lê belê ji bo vê yekê jî bêguman hêzdarkirina derfetên çareseriya demokratîk jî tekoşîna hiqûqa demokratîk a bi hêz hewce dike.



ASRIN HUKUK BÜROSU

Adres: Asmalı Mescit Mah. Şehbender Sok.

No: 18/3 Beyoğlu/İstanbul

Tel: 0212 292 95 50, **Faks:** 0212 292 95 53

Mail: ahb_iletisim@yahoo.com.tr

Di vê çarçoveyê de wekî Bûroya Hiqûqê ya Sedsalê em taybet di şenberiya Îmraliyê de pêkanînen bêhiqûq û antidemokratik tèn jiyîn, bi giştî jî li hemberî Tecrîda Îmraliyê û Pergala Îşkenceyê tekoşîna me ya hiqûqî ya demokratîk didome. Em daxwaz dikin ji vê tekoşîna hiqûqî ya demokratîk re hemû kesên bihest piştgirî bidin, saziyên hiqûqiyên netewî û navnetewiyên berpirsiyar di çarçoveya hiqûqa mafê mirovî ya gerdûnî de li gorî berpirsiyariyên xwe tevbigerin.

BÛROYA HIQÛQÊ ya SEDSALÊ